



## ŞİRETNAMEYA LÊPİRSÎNÊ

Tu hafî gazîkirin bo lêpirsînê li Daîreya Koçberan. Vê şîretnameyê baş bixwîne ku behsa maf û peywirên te dike di lêpirsînê de. eger pirsên te li ser şîretnameyê hebin, tu dikarî wan di lêpirsînê de ji karmendê Daîreya Koçberan bikî.

### Mebesta lêpirsînê çi ye?

- Te dawa penaberiya li Finlandayê kiriye. Daîreya Koçberan zêdetir lêkolînê li ser dawa te nake heta diyar nebe ka kîjan welat ji biryardana li ser dawa te berpirsiyar e.
- Di lêpirsînê de wan tiştan ron dikin yê ku tesîr li ser hindê hebe ka lêkolînê li ser dawanameya te bikin yan na. Di lêpirsînê de lêkolînê li ser sebebên dawakirina (penaberiya) te nakin.
- Welatê berpirsiyar ji dawa te li gor qanûna Yekîtiya Ewropayê li ser bingehê fermannameya (biryarnameya) bi navê Dublînê diyar dibe.
- Daîreya Koçberan bi lêpirsîna Dublînê lêkolînê li ser wê dike ka kîjan welat ji dawa te berpirsiyar e û ka lêkolînê de li ser dawa te li Finlandayê bêt kirin an na.
- Welatên peymanê Dublînê hemû welatên Yekîtiya Ewropayê û herwiha Norwec, Swîsre, Îzlanda û Liechtenstein in.
- Dikarin lêkolînê li ser dawanameya te nekin eger te parastina navneteweyî li we-latekî din yê Yekîtiya Ewropayê wergirtibe. Hingê ew nabe rêbaza (prosedûra) Dublînê. Di vê lêpirsînê de dê ronkirinê li ser hindê bikin ka çima tevî wê jî divê lêkolînê li ser dawanameya te (li Finlandê) bikin.
- Eger tu dawa îqameyeke din jî bikî, divê ku tu dawanameyeke din ya bi pare pêşkêş bikî. Dawa dikare bo nimûne ji ber karkirinê yan malbatê be.

## Di lêpirsînê de çi mafên te hene?

- Te maf heye di lêpirsînê de parêzer an avukat bi kar bînî. Tu bi xwe ji peydakirina parêzer berpirsiyar î. Parêzer bi xwe biryara beşdarbûna xwe dide.
- Di lêpirsînê de terciman heye. Karê terciman ew e ku her tiştê gofî bi bêalîfî wergerîne. Terciman dikare li wî cihî be yan jî li ser telefonê yan vîdyoyê be.
- Lêpirsker, terciman û parêzer xwedî wezîfeya parastina surran in anku nabe ew tiştên di lêpirsînê de bihîstî bo kesên din aşkere bikin, heta bo endamên malbata te jî.
- Belgenameyên li ser doza te bi surrî tên parastin.

## Di lêpirsînê de çi berpirsiyarên te hene?

- Li ser berpirsiyariya te ye ku behsa wan halet û sebebên bikî ku çima dawa penaberiyê dikî. Bo te baş e ku bi rastî behsa hemû sebebên heyî di lêpirsînê de bikî.
- Bo te baş e ku herwiha behsa pirsgirêkên dijwar jî bikî. Mumkin e ku ew çaresaz bin li ser biryara ku bidin te.
- Eger tiştêkî nizanî yan neyê bîra te, hewl nede ku bersivekê ji bal xwe ve çêkî. Dayîna agahiyên nerast dikare bibe sebebê bawernekirina ji dawa te.
- Di lêpirsînê de nasnameya xwe rast bibêje. Tu dikarî dûvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenameyên resmî yê hikûmî biguherîni.
- Dayîna agahiyên nerast yê nasnameyî tawanek e ku tê cezakirin.
- Bizane ku dayîna agahiyên nerast yan veşartina agahiyên rast dikare bibe sebebê wê yekê ku îqameya dayî te ji te bistînin yan birêvebirina dawa te aloztir bibe.

## Çawa xwe bo lêpîrsînê hazir bikî baş e?

- Berî lêpîrsînê hemû şîretên karbidestan dayî te bixwîne û bîne bîra xwe. Giring e ku tu belavokên derbarê rêkarên Dublînê binasî. Eger ew belavok li ba te nebin, dikarî wan ji malpera Daîreya Koçberan peyda bikî: [migri.fi/esitteet-ja-julkaisut](http://migri.fi/esitteet-ja-julkaisut). Belavok li bin sernavê "Turvapaikka ja Dublin-menettely" (Penaxwazî û rêkara Dublînê) ye.
- Eger bixwazî terciman jin an mêr be, berî roja lêpîrsînê bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dê hêviya te bigihîne Daîreya Koçberan.
- Eger halê te yê laşî yan ruhî wisa be ku tesîrê li ser lêpîrsînê bike, bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dikare bi izna te berî lêpîrsînê wê bibêje Daîreya Koçberan.
- Xwarinê yan pare bo firavînê li gel xwe bîne.
- Dermanê bi rojê bo te lazim bin li gel xwe bîne.
- Hemû wan belge name û îsbatan li gel xwe bîne ku têkilî dawa te ne.
- Zarokan li gel xwe neîne eger ew jî nehatibin gazîkirin bo lêpîrsînê. Eger tu hewceyî çavdêriya zarokan bî, berî roja lêpîrsînê bibêje kampa xwe.
- Berî dema xwe were. Bo ghiştinê zû bi rê bikeve. Kampa te dê şîretan bide te ku çawa dikare bigihî Daîreya Koçberan.

## Roja lêpîrsînê li Daîreya Koçberan wiha bike

- Gava tu tê avahiyê Daîreya Koçberan, dikarin teffîşê li te bikin.
- Karta xwe ya kampê nîşanî dergehvanê Daîreya Koçberan bide.
- Tenê kesên gazîkirî dikarin bî avahiyê Daîreya Koçberan û kesên ku biryar li ser hatina wan li gel te hatiye dan.
- Eger bixwazî alîkarek li gel te bê, ew dikare pêştir bi nivîskî ji Daîreya Koçberan daxwaz bike. Wek din lêpîrsker biryarê dide ka alîkar dikare beşdar bibe yan na. Alîkar ne parêzer e û beşdarî ronkirina meseleyê nabe.
- Lêpîrsker karmendekî Daîreya Koçberan e. Ew dê li salona çavdêriyê gazî te bike.
- Dengê lêpîrsînê tê qeydkirin. Li odeyê herwiha kameraya çavdêriyê ya qeydker heye.
- Lêpîrsîn hemû rojê vedikêşe. Di navberê de bêhnvedana firavîn xwarinê û hinek bêhnvedanên din hene. Tu dikarî herdem dawa bêhnvedanê bikî.
- Eger hewce be, dikarin rojêke din lêpîrsînê bidomînin. Hingê dê careke din gaziyek bo te bê.

## Di lêpîrsînê de çi dibe?

- Destpêkê lêpîrsker dibêje ka di lêpîrsînê de çi dibe û piştrast dike ku tu maf û peywîrên xwe fehm dikî. Bîpirse eger tiştêkî fehm nekî. Bibêje eger ji terciman fehm nekî.
- Lêpîrsker van tiştan ji te dipirse:
  - agahiyên nasnameya te
  - agahiyên bajarê te li welatê te
  - agahiyên malbat û mirovên te li welatê te û li Ewropayê
  - agahiyên îqame, vîze û dawayên penaberiyên li welatên din
  - agahiyên mayîna te li Ewropayê berî hatina Fînlândayê
  - rêya hatina te bo Fînlândayê
  - sebebên ku çima te venegerînin welatekî din
  - sebebên ku çima divê lêkolînê li ser dawanameya te (ya penaberiya li Fînlândê) bikin eger te parastina navneteweyî li welatekî din wergirtibe
  - nêrîna te li ser derxistin û qedexeya vegeerîna
- Bi rastgoyî bersiva pîrsan bide. Derewan neke. Bibêje eger tu tiştêkî nizanî yan nayê bîra te.
- Dawiyê terciman dê bo te wê bîrnameyê bixwîne ku lêpîrskerî nivîsiye. Eger xeletî tê de hebin, divê ku tu bibêjî lêpîrskerî. Tu dikarî herwiha tiştan lê zêde bikî. Piştî wê bîrname tê îmzakirin û kopiyekê jê didin te.

## Daîreya Koçberan çawa biryarê dide?

- Di fermannameya Dublînê de hinek sebeb hene ku dikin filan welat ji biryardana li ser dawa te berpîrsiyar be. Ew sebeb ev in: 1) endamên malbatê li welatekî Dublînê, 2) vîze yan îqame li welatên Dublînê, 3) man yan derbazbûn di welatekî Dublînê re, 4) dawanameyê penaberiyê ya pêştir. Daîreya Koçberan lêkolînê li ser van hemû sebebên dîke, li gor rêzkirina fermannameya Dublînê.
- Eger paşî bixwazî zêdetir agahî yan belgeyan pêşkêş bikî, bi nivîskî bişîne. Em li ser telefonê behsa mesela te nakin, çunkî em nikarin piştrast bin ka telefonker kî ye.
- Eger hewce be, Daîreya Koçberan dikare lêkolînê li ser orijînaliya belgeyên te dayî bike. Karbidestên welatê te ti agahiyê ji wan wernagirin û ew lêkolîn na-bin sebebê xeteriyê li ser te yan mirovên te.
- Biryar li ser agahiyên te di lêpîrsîna penaberiyê de dayî û belgeyên din yê pêşkêşkirî tê dayîn.
- Eger biryara vegeerandina te bo welatekî din bêt dayîn, tu dikarî itirazê li biryarê bikî li dadgehê. Dikarî herwiha dawa izna mana li Fînlândayê bikî hefta ku biryar li ser itiraza te bêt.
- Eger lêkolînê li ser dawa (te) nekin, dikarin te vegeerînin û hatina bo Fînlândayê û welatên din yê hevpeymanên Schengenê li te qedexe bikin.